# Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

www.ronahi.net/ku/ Jimar :879 11-Tîrmeh- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî



Navnîşan

www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165




Çavika Ronahî:Dilîn EHMED

## Siyabend rahiştiye bilûra Egîdê Cimo



Siyabend Guler 10 salî ye û li alabanê dixe. Li gorî nûçeya nûçegihana ANF Zerya Can, Siyabend Guler li Taxa Şerefye ya navçeya Riya Armûşê ya Wanê û birayê wî yê piçûk Semend Guler yê 8 salî li balabanê dixin. Xelkê taxê li dora wan kom bûye û dibêje, Siyabend û Semend rahiştine bilûra Egîdê Cimo.

Siyabend Guler ji Zerya Can re gotiye, 8 salî dest bi lêxistina balabanê kiriye û ji hingê ve li gorî kilamên berhemên Mîrê Bilûrê Egîdê Cimo dixe. Siyabend ji bavê xwe hînî vî hunerê bûye. Siyabend ji Êlihê ye û ji bo ku civak li vê çandê xwedî derkeve bajar bi bajar digere û li bilûr û balabanê dixe. Guler bi bavê xwe yê bilûrvan Çetîn Guler re li bajarên Kurdistanê digere û li kûçeyan hunera xwe pêşkêş dike.

Guler, mûzîka kilamên dengbêjan bi nota lê dixe. Ji bo fêrî tevayiya formên mûzîka kurdî bibe bernameyeke dorfireh ji xwe re çêkiriye û dixwaze paşê di vî warî de bibe perwerdekar. Xeyala herî mezin ya Guler ew e ku weke Mîrê Bilûrê Egîdê Cimo serketî be.

***Ozgûr Polîtîka***

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | İ | Z | ■ | H | ■ | A | F | E | T |
| 2 | N | A | V | E | N | D | ■ | F | A |
| 3 | ■ | X | ■ | K | A | ■ | A | R | ■ |
| 4 | N | O | T | A | ■ | A | ■ | Î | Ş |
| 5 | Ê | ■ | O | R | O | J | E | N | Î |
| 6 | R | A | ■ | Î | D | ■ | C | ■ | R |
| 7 | G | U | H | ■ | E | B | E | D | Î |
| 8 | I | ■ | O | F | ■ | Î | L | O | N |
| 9 | Z | O | ■ | E | M | R | ■ | T | ■ |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | ■ | | | ■ | | ■ |
| 2 | ■ | | ■ | | | ■ | | | |
| 3 | | | | | ■ | | ■ | | |
| 4 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 5 | ■ | | ■ | | | | | | ■ |
| 6 | | | | ■ | | ■ | | ■ | |
| 7 | | ■ | | | | | | | |
| 8 | | | ■ | | | ■ | | | |
| 9 | ■ | | | | | | ■ | | |

### ÇEP-RAST

1. Kesê nemirî... Pevdenga kurdî
2. Tîpên navî yên “saet”ê... Ji bo tiştêb ku navên wan nayên bîra mirov, yan jî mirov naxwaze bi nav bike (Bi taybetî li herêma Amedê tê gotin)
3. Paytexta Îtalya... Kurtiya elementa Aktînyûmê
4. Cephe, bere... Kurtiya her wekî din
5. Bayê rojhilat
6. Kanaleke televizyonê ya mûzîkê ya kurdî
7. Bi qasî ku wergere, xwarbûna kêştiyê ber bi aliyekî ve
8. Kurtebêja Antîmonê... Rojek... Cihê ku maden û xwê jê tê derxistin
9. Beşer, mirov... Jimar du, çar, şeş, heşt û hwd.

### JOR-JÊR

1. Notayek... Alava ku pê hespan tîmar dikin
2. Berhema ku nivîskarê wê ne diyar e... Jin yan jî mêrê ku hemsera/ê wî/wê miriye
3. Notayek... Li hin herêman li şûna ‘dayîk’ê tê gotin
4. Kurtiya ajansa fermî ya Tirkiyê... Cihê ku çûk û teyr lê datînin
5. Kurtebêja Ksenonê... Paytexta Kûba
6. Mija ku li asîman berî baranê komî ser hev dibe û jê baran dibare
7. Axaftinên herêman
8. Cure, celeb... Sir, tiştê her kes pê nizane
9. Kurtiya Koma Civakên Kurdistanê... Lewheya ku tiştan li serê dinivîsîn yan jî danebihîzan pê ve dikin.

## Quncika têgînan

| | |
|---|---|
| Damezirandin | Avakirin, sazkirin: Salvegera damezirandina Komara Kurdistanê. |
| Dameziríner | Kesê ava kirî: Damezirînerê komarê li meclisê sond xwar. |
| Diyarker | 1. Kesê ku tiştekî dide zanîn. Xuyaker, ronker, zelalker, ragihîner. 2. Kesê yan tişta bingehî. |
| Hevrê | Kesên ku hizir û baweriya wan weke hev. Bi taybetî di siyasetê de. |
| Mayînde | Tişta ku demdirêj dimîne. Xurt, qayîm. |
| Pejirandin | Qebûlkirin: Pejirand, ango qebûl kir. |
| Rêxistin | Komek mirovên ji bo heman armancê bi hev re dixebitin. Organîzasyon, sazûman, teşkîlat, kom, partî, hizb. |
| Senato (Îtalî) | Li hin welatan li gorî temen û perwerdeya endamên parlamentoyê, meclisa hatî avakirin. Ciyê ku senator lê kom dibin. |
| Senator (Îtalî) | Endamê senatoyê. |
| Tengav | 1. Ciyê teng yê av tê re derbas dibe. 2. Kesê ji bo tiştekî ketî tengiyê: Ez ji bêperetî tengav bûme. 3. Kesê destava wî ya piçûk tê. |

## Tûrikê Çîvanokan

***Di tûrikê me de îro sirûda li ser gur heye. Di nava civakê de gelek caran dema behsa gur dikin, dibêjin, “mamê gur”. Di nava civakê de weke din gelek çîrok, çîvanok û biwêj li ser gur hene. Biwêjek wiha ye: “Tu dibêjî qey ji devê gur felitiye.” Ango pir tirsiyaye; pizdiyaye; kezebê wî qetiyeye. Biwêjeke din jî wiha ye: “Em ji devê gur felitîn.” Ango em ji xetereke pir mezin rizgar bûn. Ji bo kesên durû jî wiha dibêjin: “Bi gur re dixwe bi şivan re şînê dike.” Weke din çavên wî pir dijwar in. Dibêjin, gur di şeva reş de û di nava şova reş de, miya reş dibîne. Sirûda li ser gur jî wiha ye:***

### GUR

Baran barî
Şev bû tarî

Gurgê zîrek
Fena tîrek

Baz da bilind
Hat nêzî gund

Gundî di xew
Xewnê bedew

Berx bariyan
Kar kariyan

Ker ziriyan
Hesp hiriyan

Se wariyan
Pez qariyan

Ga boriyan
Çêl oriyan

Gur ji xweşî
Poçik weşî

Gihat hewşê
Bal da rewşê

Gayê bi qoç



Çûnê bi boç

Guh bûne lûç
Ling bûne pûç

Baz da koxê
Ket nav rîxê

Hesp û mehîn
Çûn bi pehîn

Gur mabû şaş
Baz da bi paş

Çû cem kerê
Wî got erê

Dev da serî
Can da kerî



## “Heta rêber Apo azad nebe ti pirsgirêk nayên çareserkirin”

Dewleta tirkî ya faşîst, her ku tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan giran dike, êrişa ser hebûna Kurdan jî dijwartir dike. Derbarê mijarê de Şerîfe diyar kir ku armanca dagîrkeran qirkirina gelê Kurd e.*R-4*


Ronahî

Şopdara Rastiyê ye

www.ronahi.net/ku/ Jimar : 879 11-Tîrmeh- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî


## `Bi pergala rêber Apo jiyaneke nû hat avakirin`




Xaliya Necar diyar kir ku, di şoreşa 19ê Tirmehê de jinê pêşengiya şerê azadiyê kir. Ji ber wê şoreşa bakur û rojhilatê Sûriyê bi şoreşa jinê tê naskirin. *R-3*

# DU DIJMINÊN JIYANÊ; NEZANÎN Û DESTHILATDARÎ

7ê meha Tîrmehê pileyên xwendakarên refa 12an hatin diyarkirin. Li hemberî serkeftina zarokên xwe hin kes ketin kelecaneke wisa ku bûn kujerên zarokên xwe, hinek jî bûn kujerên jineke ducanî! Mirov li hemberî dijminê xwe çeka xwe derdixe û guleyan direşîne. Lê mixabin, nezanîn dijmina herî mezin ya xwediyê xwe û derdora xwediyê xwe ye...



## Agahî ji nûnerên PDKê revandîn nayê girtin



Revandina nûnerê Rêveberiya Xweser û endamên têkiliyan yên PYD`ê ji aliyê çekdarên PDK`ê ve ket roja 32`yan, lê hê çarenûsa wan ne diyar e. *R-2*

## Qirêjiya ava Firatê dibe sedema pirsgirkên tenduristiyê



Li rojavayê gundewarê Kobanê li gorî mehên borî jimara bûyerên jehrîbûnê yên ji ber ava qirêj bilind bûye. Bi taybetî piştî bilindbûna pileya germê, pirsgirêkên mezin yên tenduristiyê derdikevin. *R-6*

## ‘Çîrok Bang e.... Xwenasîn û Vedeng e’



Mihrîcana Heftan ya Çîrokên Kurdî ev 7 sal in dibe dengê çîroknivîsan û gel vê mihrîcanê wek şahiyekê pêşewazî dike. Herwiha îsal ji her çar parçeyên Kurdistanê û ji Ermenistan, Ewropa jî çîroknivîsên Kurd tevlî bûn. *R-7*


LEMÇLEMÇ — ZEBEŞ E DENDIKREŞ E — R-7

Bi ruhê 14’ê Tîrmehê ... — Faruk Sakik — R-5

Pêwîstiya Kurdan bi Peymana... — Ednan Muştafa — R-4

Xeter pir e, lê çare jî pê re ye — Ahmet Aktaş — R-6

# Agahî ji nûnerên PDKê revandîn nayê girtin

**Revandina nûnerê Rêveberiya Xweser û endamên têkiliyan yên PYD`ê ji aliyê çekdarên PDK`ê ve ket roja 32`yan, lê hê çarenûsa wan ne diyar e.**



10`ê Hezîranê, çekdarên PDK`ê nûnerê Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê li Hewlêrê Cîhad Hesen û endamên têkiliyên PYD`ê Mustefa Xelîl û Mustefa Ezîz ku ji bo pêşwazîkirina mêvanên xwe, berê xwe dabûn balafirgeha Hewlêrê, revandin.
Ji wê demê ve tevî xwestekên Rêveberiya Xweser û PYD`ê, PDK cihê endamên revandî û sedema revandina wan, diyar nekiriye.
Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser roja yekê ya revandina nûneran daxuyaniyek da û di daxuyaniyê de hat gotin, em dibînin ku ev kiryar aloziyê kûr dike û riya diyalogê lewaz dike. Ji ber wê em hêvî dikin ku ti aliyên başûrê Kurdistanê di vê pêvajoya hesas de nekevin pey projeyên provokatorî yên dewleta tirkî yên derxstina şerê navxweyî. Herwiha daîreyê banga eşkerekirina çarenûsa endamên hatîn revandin kir.
*ANHA*

## ‘Ebdulhekîm Beşar piştgiriya siyaseta qirkirinê û guhartina demografîk dike’

**Endamê Partiya Demokrat ya Kurdî ya Sûrî diyar kir ku Ebdulhekîm Beşar bi daxuyaniya xwe piştgiriya siyaseta qirkirinê û guhertina demografîk li Efrîna dagîrkirî, dike.**



Cîgirê serokê “Îtîlafa Sûrî”, nûnerê ENKSê û endamê rêveberiya Partiya Demokratîk ya Kurdistanê-Sûriyê Ebdulhekîm Beşar li başûrê Kurdistanê îdia kir ku ti sûc li Efrînê pêk nehatine.
Derbarê mijarê de, endamê Partiya Demokrat ya Kurd ya Sûrî (Konferans) Mihemed Elî li taxa Şêxmeqsûd ya li bajarê Helebê ji ajansa nûçeyan Hawar re axivî.
Mihemed Elî got, daxuyaniya vê dawiyê ya cîgirê serokê Îtîlafa Sûrî Ebdulhekîm Beşar ya inkarkirina sûcên dewleta tirkî û çeteyên wê li Efrînê, rewakirina dagîrkirina Efrînê ye û piştgiriya siyaseta qirkirin û guhertina demografîk e.

### ‘ENKS SÛCÊN LI DIJÎ KURDAN VEDIŞÊRE’

Elî diyar kir ku Ebdulhekîm Beşar, yek ji rêveberên ENKS`ê ye û dema ku sûcên dewleta tirkî inkar dike, ev yek nayê qebûlkirin, çawa dikare sûc û kiryarên li dijî Kurdên li Efrînê veşêre.
Elî got, bicihkirina malbatên çeteyan yên ji deverên dagîrkirî li gund û bajarê Efrînê heta roja îro berdewam dike, her wiha revandin û işkence jî didome.
Mihemed Elî diyar kir ku Ebdulhekîm Beşar bûye kesayeteke têkçûyî, cîhan tev dibîne ka li Efrîna dagîrkirî çi diqewime û tevayiya rêxistinên mafên mirovan kiryar û sûcên ku rojane li dijî welatî û gundan pêk tên belge kirine.
Endamê P.D.K.S Mihemed Elî di dawiya axaftina xwe de piştrast kir ku armanca daxuyaniya Ebdulhekîm Beşar ew e ku rê li ber danûstandin û diyaloga kurdî li Rojava bigire.
*ANHA*

## ‘Li hemberî dagîrkeriyê divê Kurd xwedîhelwest bin’



**Di dawiya komxebata diyalogê de banga helwesteke xurt li hemberî dagîrkeriyê û mehkûmkirina şerê navxweyî hat kirin.**

Roja Pêncşemê KNK-Rojava têkildarî xeterên dagîrkeriya tirkî yên li ser Kurdistanê û helwesta kurdî, bi durişma “Bi yekîtiya neteweyî emê dagîrkeriyê têk bibin û rê li ber şerê navxweyî bigirin”, komxebateke diyalogê li dar xist. Di komxebata diyalogê de, partiyên kurdî yên li rojavayê Kurdistanê û bakur-rojhilatê Sûriyê, tevayiya sandîkayan, yekîtî û komeleyên çandê, rêxistinnê civaka sivîl, oldar, kesayetên welatparêz, rûspiyên eşîrên Kurdan û Meclisa Rûspiyan amade bûn. Lê tevî vexwendnameya fermî, ENKS, P.D.K-S amade nebûn.
Komxebat bi van biryaran bi dawî bû
-Pêwîst e tevayiya astengiyên li pêşiya diyaloga kurdî-kurdî werin rakirin.
-Hincet çi dibe bila bibe divê şerê Kurd û Kurdan were heramkirin.
-Ji bo têkbirina dagîrkeriyê û rawestandina destwerdana Tirkiyê di kar û barê hundir yên Kurdistanê de divê helwesta raya giştî ya Kurdistanê were xurtkirin.
-Divê girêdaana bi lihevkirinên kurdî-kurdî ve were kirin, bi taybetî lihevkirina 1982’yan ya ji bo pêşîgirtina li şerê Kurd û Kurdan.
-Bang li aliyên kurdistanî dikin ku dev ji hemleyên çapemeniyê yên reşkirinê berdin.
-Divê nakokî bi riya diyalogê werin çareserkirin.
-Ji bo parastina Kurdan, bang li birayên xwe yên di rêveberiya PDK’ê de dikin ku hêzên xwe neşîne herêmên şer.
-Bi armanca parastina destkeftiyên Kurdan, divê kongreyeke neteweyî ya kurdistanî di berî gavekê were lidarxistin.
-KNK-Rojava şandeyekê erkedar dike ku vê encamnameyan bigihîne tevayiya hêz û partiyên kurdistanî.
*ANHA*

## Civîna Astana dîsa ji bo berjewendiyên wan bû

**Di civîna 16`an ya li Astana ya di nava Rûsya, Tirkiye û Îranê de, weke her car her sê aliyan li ser berjewendiyên xwe yên li Sûriyê û dijminiya Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê li hev kir.**



Civîna 16an ya rêzecivînên Astana ya di nava Rûsya, Îran, Tirkiy de ku 7 û 8`ê Tîrmehê li paytexta Qazakistan Nûr Sutan hat lidarxistin, bi daxuyaniyekê bi dawî bû. Di daxuyaniyê de bê ku behsa êşa gelên Sûriyê û çareseriya aloziyê bê kirin, behsa daxwaziyên her sê aliyan hat kirin.

### BERJEWNEDIYÊN RÛSYA

Li gorî daxuyaniyê, her sê aliyên civînê li ser berdewamkirina hevkariyê ji bo tinekirina rêxistina DAIŞ, Cebhet El-Nusra, Heyet Tehrîr El-Şam, kesayet, rêxistin û aliyên girêdayî El-Qaîde û DAIŞ`ê û rêxistinên din yên di lîsteya terorê de, herwiha li ser misogerkirina parastina sivîlan û binesaziyê li gorî qanûna navneteweyî, li hev kirine.

### BERJEWENDIYÊN ÎRANÊ

Di daxuyaniyê de herwiha behsa berjewendiyên Îranê hat kirin, êrişên leşkerî yên Îsraîlê li dijî Sûriyê hatin şermezarkirin û wiha hat gotin: “Dewletên ´garantor´ êrişên leşkerî yên domdar yên Îsraîlê li dijî Sûriyê şermezar dikin, ku ew êriş qanûna navneteweyî, qanûna mirovî, serweriya Sûriyê û welatên cîran binpê dikin û gefê li aramiya herêmê dixwin. Divê sînorek ji wan êrişan re bê danîn.”

### BERJEWENDIYÊN TIRKIYÊ

Di daxuyaniyê de behsa berjewendiyên dewleta tirkî yên li Sûriyê hat kirin û êrişî Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê hat kirin. Herwiha careke din bi “hewldanên cudakariyê” hat cûcdarkirin. Ev sûcdarî durûtiya Rûsya eşkere dikin. Lavrov di daxuyaniyên xwe yên berî lidarxistina civîna li Astanayê de, diyar kiribû ku Moskova ji destpêka şerê Sûriyê ve piştgiriyê dide pêkanîna pêwendiyên yekser di navbera Kurdan û hikumeta Şamê de.
Her sê aliyan dagîrkirina herêmên Sûriyê ji aliyê dewleta tirkî ya dagîrker ve ji bîr kir.
Li gorî daxuyaniyê, wê civîna 17`an ya Astanayê li Nûr Sultan dawiya sala 2021`ê bê lidarxistin.
*ANHA*

## Li Fransa navê Hevrîn Xelef li qadekê hat kirin

**Meclisa Şaredariya bajarê Lyonê yê Fransa navê Hevrîn Xelef li qadeke bajêr kir.**



Li Taxa Guillotiere ya bajarê Lyonê yê Fransa navê Hevrîn Xelef dan qada ber bi geraja berê ya Citronê. Şaredariya herêma 7an ya Lyonê Franny Dubot got, em vê figûra sembolîk ya kampa aştiyê ya welatekî şer lê heye silav dikin. Ev Kurda femînîst ya 35 salî hatibû kuştin.
Hevrîn Xelef 15’ê Mijdara 1984’an ji dayîk bûye. 12’ê Cotmeha 2019’an li nêzî Girê Spî ji aliyê komên çeteyên dewleta tirkî ve bi awayekî hovane hatibû şehîdxistin. Hevrîn Xelef Sekretera Giştî ya Partiya Sûriya Paşrojê bû.
*ANF*

## Dewriyeyeke din ya Rûsya-artêşa tirkî pêk hat

**Roja Pêncşemê hêzên Rûsya tevî hêzên artêşa tirkî ya dagîrker li gundên Aliyan yên navçeya Tirbespiyê û Çilaxa, dewriyeyeke hevbeş pêk anîn.**

Di çarçoveya peymana di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk û Rûsya de ji aliyekî ve û Rûsya û dewleta tirkî ji aliyekî din ve, sibeha roja Pêncşemê dewriyeyeke hevbeş ya Rûsya-artêşa tirkî li ser dirêjahiya xeta sînor li gundên herêma Aliyan yên navçeya Çilaxa û Tirbespiyê yên girêdayî kantona Qamişlo pêk hat.
Dewriyeyê ji bajarokê Dêrîna Axê ya Çilaxa dest pê kir û di gundê Etibê, Şîtka, Babasî, Kêl Hesenak, Dêrîna Qulingan, Girdêm, Til Xatûn û Şelhûmiyê re geriya û pişt re vegeriya nuqteya destpêkê.



*ANHA*



# ‘Çîrok Bang e.... Xwenasîn û Vedeng e’

**Mihrîcana Heftan ya Çîrokên Kurdî ev 7 sal in dibe dengê çîroknivîsan û gel vê mihrîcanê wek şahiyekê pêşewazî dike. Herwiha îsal ji her çar parçeyên Kurdistanê û ji Ermenistan, Ewropa jî çîroknivîsên Kurd tevlî bûn.**

**Hediya HISÊN/Qamişlo**






Bi durişma “Çîrok Bang e.... Xwenasîn û Vedeng e” 1ê Tîrmehê bi pêşengiya Yekîtiya Nivîskarên Kurd Li Sûriyê, Mihrîcana heftan ya Çîrokên Kurdî li hola Zana ya bajarê Qamişlo hat lidarxistin û 5ê mehê bi dawî bû. Herwiha ji her çar parçeyên Kurdistanê, Ermenistan û Ewropa çîroknivîs tevlî bûn û jimara wan 40 kes bû. Mihrîcan rojane saet 6an dest pê dikir û heta 7 û nîvê dewam dikir. Her roj 6 çîrok dihatin xwendin. Çîroknivîsên ji Rojava çîrokên



xwe dixwendin û yên ji parçeyên din li ser telefonê dixwendin. Di mihrîcanê de rojane 3 pirs ji beşdaran dihatin kirin. Kesê ku bersiva rast dida xelata ji 25 hezar lîreyên Sûrî û komek ji pirtûkan digirt.
Hevserokê Yekîtiya Nivîskaran li Sûriyê Egîd Qadirî li ser hilbijartina çîrokan got, 47 çîrok ji me re hatin şandin. Ji ber ku hin ji wan şert û mercên ku me diyar kiribûn pêk neanîbûn û hin ji wan di mihrîcanên borî de hatibûn xelatkirin, 7 çîrok nehatin qebûlkirin. Sê xelat hatin diyarkirin; xelata yekê milyonek û 500 hezar, ya duduyan milyonek û ya sisiyan 500 hezar.
Şert û mercên nivîsandina çîrokê wiha bû:
1- Jimara peyvan zêdeyî 500 û kêmî 2000 gotinî be
2- Çîrok nû hatibe nivîsandin û nehatibe weşandin
3- Çîrok di wordê de were şandin pey re jî nav, cih û reqema nivîskar hebe
4- Nabe nivîskar zêdeyî çîrokekê bişîne
5- Bi zimanê kurdî hatibe nivîsandin
6- Şert û mercên nivîsandina çîrokê pêk hatibin û mafê komîteya amadekar heye çîroka kêm qebûl neke
Egîd diyar kir ku komîteya amadekar 4 kes bûn û ji her çar parçeyên Kurdistanê bûn. Tişta balkêş di mihrîcanê de hunermend Şivan Perwer spasî û piştgiriya wan kir û got, tevî şer û dorpêça li ser Rojava, Hûn mihrîcanên wiha li dar dixin û nivîskaran ji her çar parçeyan tevlî dikin, ev cihê spasiyê û serbilindiyê ye. Armanca me ji mihrîcanê pêşxistina zimanê Kurdî û kurayiya têkliyan di navbera her çar parçeyan de çêbe.
Ji nivîskarên tevlî mihrîcanê bûyîn çîroknivîs û şanoger Raperîn Gilgawî ku ev cara duduyan e beşdarî mihrîcanê dibe, li ser mijara çîroka xwe axivî. Çîroka wî ya îsal bi navê “Ji Ronahiyê Bileztir e” tevlî pêşbirkê bû. Ew jî çîroka malbateke ji Efrînê ye ku du caran koçber bûne û ka çawa ji guleyên çeteyan xwe xilas dikin, dibêje. Çîroka xwe ji şerê Efrînê girtiye. Di çar rojan de ev çîrok nivîsiye.
Nivîskar û helbestvan Can Birahîm jî ku yek ji beşdarên mihrîcanê bû, da zanîn ku sala sisiyan e tevlî mihrîcanê dibe. Ji bo wî ya girîng ew e ku bi zimanê dayîkê dinivîsin û çanda xwe bi çîrokên xwe diparêzin. Ji sala 1988an ve çîrok û helbestan dinivîse. Çîrokên ku niha jî dinivîse giş serpêhatî ne û ji şerê Kobanê girtine.
Can da xuyakirin ku çîroka îsal nivîsî rastiya bûyereke li Kobanê qewimî ye û wiha axivî: “ Navê çîroka min Zarokin Lê Weke Şêran in. Çîroka du zarokên 10 û 12 salî ye ku di şerê Kobanê de direvin û bi serê xwe çar mehan li gundekî dimînin. Di wan



her çar mehan de ava baranê vedixwin û arvanê malan dixwin. Armanca min ji beşdariya mihrîcanê ew e ku em çîrokên kurdî pêş bixin û ji nifşên nû re çanda çîrokan biafirînin.”
Mihrîcan 5ê Tîrmehê bi dawî bû û çîroknivîs Merwan Berekat, Kerem Tagoglu, Lema Elî û Qado Şêrîn bi ser ketin. Pişt re hunermend Îmad Darî çend ji stiranên kurdî gotin û di dawiyê de hevserokê Yekîtiya Nvîskaran Qadir Egîd spasiya Çîroknivîsan tevan kir û destegul û pirtûk li wan belav kirin.
Merwan Berekat ku ji koçberên Efrînê ye û niha li Şehbayê dimîne,diyar kir ku xelata girtî wê li malbatên penaber û xizan yên li Şehbayê belav bike. Herwiha spasiya beşdaran kir û got, ez bi hêvî me ku mihrîcanên wiha berdewam bikin.

## “Divê em hunermend piştgiriyê bidin berxwedanê”

**Navenda Nûçeyan**





**Şaristanî ji çandê dest pê dike û di nava çandê de her tişt geş dibe. Di çand û huner de hest şîn dibin û bedewî tê afirandin. Ji ber wê divê mirov çanda xwe pêş bixe û derfetê nede desthilatdaran ku rehên civakê lewaz bikin. Çimkî bi windabûna çandê civak jî winda dibin.**

Koma Nûpelda ku ji 2014an ve hatiye avakirin, bi hevkariya çend hunermendan çandê diparêze û kar û xebata xwe didomîne.
Rêveberê koma Nûpelda Aram Xelîl got, her welat bi çanda xwe tê nasîn. Welatê me jî, di warê çand û hunerê de pir dewlemend e.
Aram bîr xist ku di dema deshilata Be´es de, Kurdan nikarî li ser çanda xwe bijîn û axaftina xwe wiha domand: “Li bakur û rojhilatê Suriyê berî ku şoreş dest pê bike ti kesî girîngî nedida çand û hunera xwe. Lê piştî destpêkirina şoreşê, em nêzî çanda xwe bûn û ji wê demê ve hunera xwe pêş dixin û li çanda xwe xwedî derdikevin. Di hunerê de mirov hestê xwe derdixe pêş. Dema em stiranan dibêjin pir kefxweş dibin. Keyf û hestên me di stiranê de diyar dibin. Ev bawriyê bi me re çêdike û dihêle ku em bi heskirina welatê xwe ve girêdayî bin.”
Aram got, ji ber ku em tev piçûk bûn û nû dipişkivîn me navê Nûpelda li komê kir û axaftina xwe wiha domand: “Koma Nûpelda 2014an bi tevlîbûna çend endaman hat avakirin. Wê demê em tev piçûk bûn. Em deh endam di komê de ne. Pênc jin û pênc zilam in. Stiranên me piraniya wan şoreşgerî ne, lê hin caran em yên folklorî jî dibêjin. Armnca me ji komê, ew e ku gelekî şoreşger bighînin û parastina çanda xwe bikin. Em bi civaka xwe ve girêdayî ne. Çimkî em moralê ji gel digirin û gel jî ji me digire. Bi vî awayî em hev temam dikin. Em tevlî şahî, çalakî û mihrîcanan jî dibin.”
“Divê em piştgiriyê bidin berxwedêr û lehingên azadiyê”
Aram got, divê em piştgiriyê bidin lehengên azadiyê û axaftina xwe wiha domand: “Demeke dirêj e li çiyayên Kurdistanê şerekî pir dijwar heye. Ev şer şerê hebûn û nebûna gelê Kurd e. Ji ber wê û ji bo ku em bi hev re bersivê bidin van dagîrkeran, divê em hunermend piştgiriyê bidin berxwedêr û lehengên azadiyê. Çimkî ev têkoşin û berxwedan ji bo azadiya gelan e. “
Rêveberê koma Nûpelda Aram Xelîl got, dijmin êrişî çand û nasnameya me dike û axaftina xwe wiha qedand: “Dijmin her tim dixwaze me ji çand û hunera me dûr bixe. Lê çi dike bi ser nakeve. Çimkî li hemberî kiryarên wê qehremanî û têkoşîn tê kirin. Herwiha emê bi hunerê piştgiriya çiyayên azad bikin û destekê bidin gerîlayên xwe.”

## LEMÇLEMÇ



### ZEBEŞ E DENDIKREŞ E

Silav ji we re, ez bawer dikim we jî îsal zebeşek xweş nexwariye, malnemîrata êdî ne tam e ne reng e, ne jî dendik e, ji goştê mirîşkê yê hatî qerisandin û pişt re derdixin têxin nava avê de ji bo bihele nermtir bûne zebeşên îsal. Vêca ser vê re jî Çîniyan qalib ji bo zebeşan çêkirine û êdî zebeşên sêkoşe, çarkoşe, têrkoşe, kuşkuşe çêdikin. Piştî Amediyan û Osman Sebrî ev bihîst, hem di meclisê de hem jî li kolanên Amed û li ser birca wê qiyameta mirovan rabû. Kepengên xwe anîn xwarê û ketin kolanan û Çîn protesto kirin. Bi durişmên bila Çîn xwe ji qirêjiya koronayê xilas bike, xêr e xwe li zebeşan dide. Zebeş e dendikreş e, em nadin te tu Hebeş e. Çawa dibe Çînî xiyaneteke wisa li Amediyan bikin. Qehwecî, cigercî, beqlewacî, Denîz Nakî, Beytocan, Kemalê Amed rabûn ser piyan, gel kom kirin û daxuyaniyek dan. Rêveberên Amed sporê jî daxuyaniyek dan û wiha gotin: “Ma emê êdî çawan qeleciyên xwe fêrî girtina topê bikin, zebeş çarkoşe be yan sêkoşe be wê qelecî çawa bikarin bigirin, ev tiştekî ne rast e û bi zebeşan nelîzin. Li aliyê din qeleciyên cîhanê yên weke Buffun, Navas, Kamenî, Muslera li ser torên medya civakî twîtek avêtin û gotin, bê zebeşên Amedê em ne tiştek bûn, em bi saya wan zebeşan niha di asta herî jor de ne û em Çînê şermezar dikin. Bila pêşî li mezinbûna qeleciyên nû negire. Li aliyê din ji aliyê saziyên hundir, saziyên dikandaran, karkerên zebeşan bi hev re civînek li dar xistin. Di civîna xwe de hinek biryarên tund li ser Çînê ragihandin. Hinek ji wan biryaran jî evin;
Wê navên hemû dikanên ku marka Çînê li ser e, li kêleka wê wêneyê zebeşê Amedê daleqînin. Heçiyê tîştekê ji wan bikire li kêleka wê divê zebeşekê jî bikire.
Wê meşek were lidarxistin û heta qada Newrozê bimeşin, ev meşa wan jî wê ji aliyê Stêrk tv, Medya Haber, BBC, CNN Turk ve zindî were weşandin.
Wê ev bûyer li meclisa Turkiyê were nîqaşkirin û berdevkê konsolosxaneya Çînê wê her roj zebeşek yê Amedê bikire û li xebatkarên xwe belav bike.
Wê hunermendên me yên weke, Kemalê Amed, Koma Gel, Evdilmelîk, Serap Sonmez û Chopy konserên xwe yên li Çînê betal bikin û ji bo zebeşên Amedê qlîbekê bi hev re çêkin.
Wê Meral Şîmşek romanek û Azad Zal pirtûkekê li ser dîroka zebeşên Amedê binivîsin, çap bikin, wergerînin Çînî û di sûkên Çînê de bifiroşin.
Amedî wê îhaleyên xwe hemûyan bidin betalkirin.
Wê komeke berfireh were amadekirin û herin Çînê, semîneran pêşkêş bikin û sudên zebeşên Amedê ji bo koronayê çi ne were ragihandin.
Dikandarên Amedê wê raporekê pêşkêşî Yekîtiya Ewropayê bikin ku tê de dibêje divê Çîn ji Yekîtiya Ewropayê derkeve.
Şeyhmus Dîken, Cemal Yilmaz li beramberî Çîniyan şereke teknolojiyê bikin, wê erebeyên girover çekin û tekerlekê wan jî têrkoşe çêkin.
Di van biryaran de jî pir cidî nêz dibin. Helbestvanek di mitînga li dijî zebeşan de ev helbesta ha xwend, me got em wê jî bi we re parve bikin, kerem bikin bixwin na na bixwînin, zebeşan bixwin, lê ne yên çîniyan.

Zebeş e dendikreş e
Tama wî bi zilq û zibl ê kevokan dimeşe
De were bibîne çiqas xweş e
Pê dibî weke serxweşe
Ne Ruştu, ne Muslera
Va ye dipije qelecî Abdullah
Zebeşê me li ber devê kerê reş e
Got min divê welatê xweşe
Te xêr e dikî goşegoşe
Emê li we bikin roja reşe

***Rojnameya Rojev***

# Qirêjiya ava Firatê dibe sedema pirsgirkên tenduristiyê

Li rojavayê gundewarê Kobanê li gorî mehên borî jimara bûyerên jehrîbûnê yên ji ber ava qirêj bilind bûye. Bi taybetî piştî bilindbûna pileya germê, pirsgirêkên mezin yên tenduristiyê derdikevin.

Dewleta tirkî ya dagîrker ev 5 meh in ava çemê Firatê li ser herêmê biriye. Ji ber wê ava çem kêm bû û di encamê de qirêj bû. Herwiha ji ber gemara avê gelek rewşên jehrîbûnê derketin. Lewra welatî ava vexwarinê ji çemê Firatê tînin.



**“AVA BÎRAN ŞÛR E Û AVA ÇEMÊ GEMAR E”**

Welatiyê bi navê Mihemed Faris yê ji gundê El-Cede yê başûrrojavayê Kobanê, ku ji ber ava çem jehrî bûye û niha li navenda tenduristiyê ya Qinayê tê dermankirin, got, êdî jiyana me di xeterê de ye. Lewra me ji ava gemar gelek zerer dît. Nava me li hev dikeve, em vedireşin. Lewra tê de kurmik hene. Em nikarin ava bîran jî vexwin, lewra ew jî şor e. Em hêvî dikin ku ava çemê Firatê careke din biherike û em jî ji vê rewşê xilas bibin.

Ji rêvebariya navenda tenduristiyê ya navçeya Qinayê bijîşk Umer Feyad têkildarî mijarê wiha axivî: “Her sal vê demê welatî bi jehrê dikevin. Lê îsal ev diyarde zêde bûye. Ji ber ku ava bîran şor e, welatî ji çemê Firatê vedixwin û ew jî ji ber birîna avê ji aliyê dewleta tirkî ve qirêj bûye.”

Dr. Feyad axaftina xwe wiha domand: “Çareserî paqijkirina avê bi klorê ye. Eger ev neyê kirin wê bûyerên jehrîbûnê di rojên pêş de pirtir bibin. Lewra vê mehê jimara bûyerên jehrîbûnê ji meha borî pirtir e. Ji ber ku ava bîran şor e, welatî nikarin ava wan jî vexwin.”

**SEDEMÊN JEHRÎBÛNÊ**

Gelek sedemên vê nexweşiyê hene. Jek jê çirav in ku ji ber kêmbûna ava çemê Firatê çêdibin. Ya din kehrebe ye ku ew jî ji ber kêmbûna avê ye. Ji ber wê welatî nikarin xwarinê di sarincan de biparêzin û xerab dibe. Ev ji dibe sedemê nexweşiyê. Sedema sisiyan jî xwezaya herêmê ye. Herêm herêmeke çandiniyê ye, lê ji ber kêmbûna ava çemê Firatê çandinî jî pir qels e.

Dr. Feyad bang li welat iyan kir ku yekser avê ji çem venexwin û xwarinê ji bo rojekê tenê çêkin. Herwiha bang li rêxistinên hiqûqî kir ku ji bo herikîna çemê Firatê bikevin nava tevgerê. Lewra ji ber sûcên dewleta tirkî ya dagîrker jiyana gel di xeterê de ye.

Li gorî daneyên navenda tenduristiyê ya navçaya Qinayê, vê mehê 350 kes bi jehrê û 250 kes jî bi zikêşê ketine. Meha Gulanê 300 kes bi jehrê, 270 kes jî bi zikêşê ketibûn. Herwiha meha Hezîranê 400 kes bi jehrê, 325 kes jî bi zikêşê ketin.

***ANHA***

# Welatiyên Til Temir bi çareseriya aloziya nan keyfxweş bûn

**Komîteya Aborî firûna siyahî veguhert firûna otomatîk û aloziya nan li navçeya Til Temir çareser kir.**

Berî niha bi demekê li navçeya Til Temir aloziya nan derketibû. Komîteya Aborî ya Kantona Hesekê bi hevkariya xwediyê firûneke nanê siyahî firûn veguhert firûna otomatîk da ku pêdiviya welatiyan ya nan pêk were. Bi wê awayî alozî hat çareserkirin.

Girêdayî mijarê, xwediyê firûna siyahî ya berê Ebdulezîz Mîro wiha axivî: “Firûnê nanê siyahî çêdikir, lê bi derketina aloziya nan re Desteya Aboriyê û Rêveberiya Xweser pêşniyar kirin ku em firûnê bikin otomatîk. Min jî erê kir û ev dikeve xizmeta gel.”

Mîro diyar kir ku Rêvebariya Firûnan rojane 3 ton ard dide firûnê, da ku pêdiviya bajêr ya du rojan pêk bîne û firûn 2 hezar û 600 kîs nan derdixe.

Mîro di dewama axaftina xwe de da zanîn ku veguhertina firûna siyahî ji ya otomatîk sûdeke mezin dide welatiyan û alozî ji sedî 50 bi dawî kir. Herwiha firûneke navnedî ji bo pêdiviyên gundan ya nan hat diyarkirin. Lê ev firûn pêdiviya bajêr pêk nayne.

Mîro got, firûn têra bajêr tevî dike û alavên tê de nûjen in. Rêveberiya Firûan jî niha hewl dide ard zêde bike, da ku pêdiviya herêmê ya nan bi awayekî mezin pêk bîne.



***ANHA***

# Koçberên Serê Kaniyê komxebatek li dar xistin

**Koçberên Serê Kaniyê bi durişma “Em bimînin, emê vegerin”, ji bo nîqaşkirina sûcên ku dagîrkiriya tirkî li Serê Kaniyê dike, komxebatek li dar xistin.**

Komxebat li Hola Tayfûr ya li navenda bajarê Hesekê hat lidarxistin. Di komxebatê de herwiha koçberên ji bajarê Serê Kaniyê yê dagîrkirî bi tevayiya pêkhateyên wê, rûspiyên eşîran, nûnerên partiyên siyasî, Hêzên Sûriya Demokratîk, Yekîneyên Parastina Gel û Jin, nûnerên Rêveberiya Xweser, malbatên şehîdan, endamên rêxistinên civaka sivîl û nûnerên koalisyona Navneteweyî beşdar bûn.

Komxebatê bi deqeyek rêzgirtin dest pê kir. Pişt re endamê komîteya amadekar, Ciwan Îso dest bi axaftinê kir. Herwiha li ser dîroka herêma Serê Kaniyê sînevizyonek hat pêşkêşkirin. Li ser navê hêzên QSD`ê fermandarê giştî yê QSD’ê Mazlûm Ebdê bi riya televizyonê tevlî komxebatê bû û li ser kiryarên dijmirovî û sûcên ku piştî dagîrkirina Serê Kaniyê hatine kirin, axivî.

Hêjayî gotinê ye ku di komxebatê de sê xalên sereke hebûn. Xala yekê mijara hebûna dîrokî û pîvana herêma Serê Kaniyê. Ya duduyan kiryarên dijmirovî û sûcên li herêma Serê Kaniyê hatine kirin. Xala sisiyan jî bi durişma “Em bimînin, emê vegerin” wê vegere koçberan li bajarê wan teqez bike.



Herwiha armanca vê forumê ku avakirina binesaziyekê ku bibe nûner ji daxwaziyên gelê herêma Serê Kaniyê yên ku banga bidawîkirina dagîrkerî û vegera mal û warên xwe dikin re ye.

***ANHA***



**Xeter pir e, lê çare jî pê re ye**

**Ahmet AKTAŞ**

Dema li ser siyaseta cîhanî şîrove dest pê dibe, hema mijarên xeter yek li pey yekê tên rêzkirin. Xwendekar, guhdar û temaşevan jî, bêguman dikevin nava reşbînî û bêhêvîbûnê.

Îca gotina dawiyê ez di serî de bêjim. Li cîhanê hemû û ji ber ku parek ji vê cîhanê ye li Kurdistanê jî, her çendî xeter û pirsgirêk hebin, ewqas çare û derman jî hene. Jixwe li gorî diyalektîka zanistî jî divê wisa be; her tişt bi dijberê xwe heye. Li vir karê dikeve ser milê kesan, xeter û çareyê baş nas bikin û aliyê çare û başiyê zêdetir bikin.

Mirov bala xwe dide Kurdistanê, weke ku hemû pirsgrêken cihanê anîne li ser serê gelê me û xaka me ya pîroz kom kirine. Jixwe bi welatî parçe kirine, lê hê jî ranawestin, çima gel hinekî bi hiş xwe ve hatiye, hinek cîhan nas kiriye û li gorî jiyaneke aram û azad xwe bi rêxistin kiriye, hewl didin ji bo vê xerab bikin, çi destkeftiyên hebin jê bistînin û ew koletiya jê re pejirandine dîsa bidin dewamkirin.

Kurt kurmancî ev e; bi giştî li hemû parçeyên Kurdistanê, di encama berxwedan û xwîn û xwêdaneke mezin de, îradeyek xurt û destkeftiyên berbiçav derketine holê. Vê îradeya azadîxwaz, li Başûr pergaleke federalî û li Rojava pergaleke xweseriya demokratîk ava kiriye û li dora deh salan e bi vî awayî dijîn. Kêm-zêde debara xwe dikin û eger ji derve destdirêjî nebe, wê bikarin vê deskeftiya xwe, vê pergala xwe ya xweser pêşe bixin û mezintir bikin.

Lê mixabin, giregirên cihanê DYA û Rûsya di serî de, hinek dewletên hegemonên cîhanê, bi çar dewletên mêtînger re, bi taybetî bi riya dewleta Tirkab û xiyaneta Kurdan dest avêtine vê xaka pîroz û dîrokî û destdirêjî nava vê pergala gel ya xweser kirine.

Jixwe dîtineke hevpar heye ku cîhan ketiye qonaxa despêka cenga cîhanî ya sisiyan. Çendî piştî têkçûna Pakta Varşova, ew dubendiya mezin ya navbera NATO û VARŞOVA hejiyabe jî, dîsa di pêşengiya her du dewletên nasyar de tê nûjenkirin. Lê ya yekê ÇÎN, rola Japonya, Îran, Hindistan, YE û hwd, ji berê mezintir bûne. Eger mîzahî be jî, xaka Kurdistanê “di binê lingên hespên van giregiran de dinale”. Bi taybetî DYA û Rûsya, gelek giranî dane ser Rojhilata Navî, belê navend Kurdistan e. Ji bo berjewendên xwe pêk bînin, gelê Kurdistanê gelek êşandin û hê jî wan siyasetên kevnar didomînin. Lê weke tê gotin rast e, êdî Kurd û Kurdistanî ne yên berê ne, êdî tama/lezeta azadiyê û xweseriyê hildane û nema koletiyê qebûl dikin û têra xwe jî, xwe bi rêxistin kirine. Bi tenê yekîtiyeke neteweyî ya xurtir divê. Weke hat gotin, van siyaset û kiryarên koledarî, bi xwe re dijberên xwe jî afirandine. Herwiha di nava xwe de jî êdî weke berê nikarin serweriya yekdestî bi hêsanî bidin meşandin. Di nava gelek alozî û qeyranên mezin de vedigevizin.

Piştî ewqas zulum û polîtîkayên qirêj jî bi ser neketin, êdî niha her du dewlet yan jî hegemonên giregir bi giştî, li gel dewamkirina siyaset û kiryarên xwe yên gemar yên kevin, bi Tevgera Azadiya Kurdistanê re jî dest bi hewldanên danûstandinên nû kirine. Wateya vê, êdî tengav bûne û hewcedarên Tevgêra Azadiya gelê Kurdistanê ne. Daxwiyaniya Lavrov ya dawî, mînakek e! Ev qonaxeke nû ye, hem dijwari û xeter hem jî hosteyî û çareserî gelek in û her du jî di nava hev de ne û bi hev re dimeşin. Reşbînî na, xweşbînî ras te.



# `Bi pergala rêber Apo jiyaneke nû hat avakirin`

Xaliya Necar diyar kir ku, di şoreşa 19ê Tirmehê de jinê pêşengiya şerê azadiyê kir. Ji ber wê şoreşa bakur û rojhilatê Sûriyê bi şoreşa jinê tê naskirin.

**Dilîn EHMED/Qamişlo**

Şoreşa 19’ê Tîrmehê ya rojavayê Kurdistanê, bû sembola berxwedana gelê Kurd û ya herêmê. Bi taybetî ji bo pêşxistina azadiya jinê, şoreşê mohra xwe li derokî da. Berî şoreşa Rojava gelê Sûriyê, bi taybetî gelê Kurd, ji aliyê rejima Be´es ve ji her alî ve hatibûn helandin. Rejimê bi siyaseta xwe, ziman, nasname û çanda gelê Kurd ji holê rakiribû. Ji ber wê gelê rojavayê Kurdistanê Şoreş mîna kilîta çareserkirina pirsgirêkan pênase dike. Jin jî bi destpêkirina çirûska şoreşê, bû pêşenga tevayiya qadên civakê. Li bakur û rojhilatê Sûriyê jin di qada rêxistinî, siyasî, leşkerî, çandî û civakî de bûn xwedîroleke girîng. Jinan bi têkoşîn û xebatê mohra xwe li şoreşa 19`ê Tîrmehê xist.

**Ji ber hêza wê ya xurt bû armanca dijmin**

Li ser vê mijarê Endama Komîteya Aboriya Jinê ya bakur û rojhilatê Sûriyê ya Kongreya Star Xaliya Necar, da zanîn ku ji ber ku di Şoreşê de jin bû pêşeng û zincîra koletiyê qetand, di êrişan de bû armanca dijmin. Xaliya axaftina xwe wiha domand: “Destpêkê ez tevayiya şehîdên Şoreşê bîr tînim û em bejna xwe li ber têkoşîna wan ditewînin. Berî şoreşa Rojava, heta asteke baş jinan xwe bi rêxistin kiribû. Şoreşa Rojava bû sedema pêşxistina kar û xebata jinan. Ji ber wê em dibêjin şoreşa Rojava, şoreşa jinê ye. Di tevayiya qadên civakî de jinên rojavayê Kurdistanê bi taybetî jina Kurd, bûn sembola jinên cîhanê. Ev tev jî bi saya xwîna şehîdên azadiyê ye. Ji ber wê di her êrişa ser herêmê de, jin bû hedefa dagîrkeran û şerê taybet.”

Xaliya Necar got, jin nûner û bingehê pêşxistina şoreşê ye. Ji ber wê tirs ketiye dilê mirovên xwediyên mejiyên desthilatdar û wiha berdewamî da gotinên xwe: “Ji destpêka Şoreşê heta roja îro, ji bo parastin, misogerî û pêşxistina destkeftiyan, jinê pêşengî û têkoşîn kir û dike. Lewra dema karek ji jinan tê xwestin, bi tevayiya hêza xwe wî karî pêş dixe. Ev jî bi saya fikir û felsefeya rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan e, ku ev bawerî di kesayeta jinan de ava kir.”

Xaliya da xuyakirin ku rêber Apo bi têkoşineke bêhempa, bi fikir û felsefeya xwe ya demokratîk jin kir xwedîvîn. Ji ber wê jin û gelê azadixwaz hebûna xwe di pergala rêber Apo de dibînin.

**“Ji bo pêkanîna xeyalên şehîdan divê em jin têkoşînê xurttir bikin”**

Xaliya Necar axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Divê jinên me ti carî derfetê nedin ti kesî ku vîna wan bişkînin. Lewra zihniyeta desthilatdar kesayetên bihêz dikin hedefa xwe. Bêguman em jin moralê xwe ji şehîdên xwe digirin û em ji wan re dibêjin, ‘heta ruh di canê me de hebe emê li ser şopa we bin. Lewra xewn û xeyalên we, azadiya welat bû.’ Em rêxistina Kongreya Star banga xurtkirina berxwedanê li tevayiya rêxistin û tevgerên jinan dikin. Ji bo piştgiriya şoreşa jinan ya bakur û rojhilatê Sûriyê pêwîstiya me bi xurtkirina têkoşînê heye.”



# `Berxwedana zindanan bersiva tecrîdê ye`

**Navenda nûçeyan/Qamişlo**

**Fewaza Mihemed diyar kir ku, armanca tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, şkandina vîna gelê Kurd e. Lê berxwedana li zindanan ya greva birçîbûnê, bersiva vê armancê ye.**

Dewleta tirkî ya dagîrker ku dixwaze gelê Kurd tine bike, bi tevayiya rêbazên xwe di nava hewldanê de ye. Li hemberî van planan û ji bo rakirina tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, li zindanên Tirkiyê 227 roj di ser berxwedana greva birçîbûnê re derbas dibin.



Derbarê mijarê de Hevseroka Kevana Zêrîn ya bakur û rojhilatê Sûriyê Fewaza Mihemed bang li jinên rojavayê Kurdistanê kir ku, li barxwedana zindanan xwedî derkevin û heta Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan azad nebe, divê ew li ser piyan bin. Fewaza axaftina xwe wiha domand: “Parêzerên Rêbertiyê ji bo hevdîtina bi mûwekilê xwe re, her hefte serî li rayedarên dewleta tirkî didin. Lêbelê heta niha ti bersivên erênî negirtine. Armaca dewlata tirkî ji tecrîdê diyar e, dixweza ramanên Rêbertiyê ji gel qut bike. Ji ber wê li dijî vê siyasetê, divê gelê Kurd hişyar be û li seranserê cîhanê çalakiyan li dar bixin.”

**`Em deyndarên Rêber Apo ne`**

Ji 2019 ve, ne malbat, ne parêzer nikarin bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikin. 15`ê Adara 2021 li ser torên civakî yên dewleta tirkî ya dagîrker, hat weşandin ku rewşa tenduristiya Rêber Abdulah Ocalan di xeterê de ye. Vê di nava gelê Kurd de metirsiyeke mezin çêkir û li seranserê cîhanê gelê Kurd û derdorên domokratîk banga azadiya rêber Apo kirin.

Fewaza Mihemed da xuyakirin ku wek tevgera jinan li dijî hovîtiya dewleta tirkî ya faşîst ya li ser gelê Kurd û tecrîda giran ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, wê çalakiyên xwe bidomînin. Fewaza di berdewamiya axiftina xwe de got, em jin deyndarên rêberê xwe ne. Lewra bi ramanên xwe jin ji koleti û bindestiya zilam rizgar kirin. Divê em jî ji bo azadiya rêber Apo bi şev û roj xwebatê bikin, têkoşîna xwe xurt bikin û bi ser bikevin.

**`Azadiya rêbertiyê azadiya me ye`**

Hevseroka Kevana Zêrîn ya bakur û rojhilatê Sûriyê Fewaza Mihemed axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Em hêza xwe ji jinên berxwedêr û şoreşger yên mîna Ş. Sakîne, Hevrîn, Zîlan û Barîn û tevayiya şehîdên azadiyê digirin. Ji bo wê em dibêjin, bila dijmin baş bizane ku ew çi bike, wê jin têkoşîna xwe rojbiroj pêş bixe û li hemberî wan, ku dixwazin vîna jinan bi rêbazên xwe yê hovane bişkînin, nefreta xwe xurttir bikin. Ji bo jinan jî vê dibêjim heta ku Rêberê me azad nebe, em azad nabin. Lewra ya em ji koletiyê xilas kirîn ramana Rêber Apo ye.”

# Jinên Reqayê: Rêveberiya Xweser rola me di civakê de çêkir

**Navenda Nûçeyan/Reqa**

**Hesîna Mensûr diyar kir ku, ragihandina Rêveberiya Xweser ji bo wan derfeke zêrîn e, lewra cara yekê ye ku di tevayiya qadên civakî de, cihê xwe digirin.**

Sala 2014 bajarê Reqayê ji aliyê çeteyên DAIŞ`ê ve hat dagîrkirin. Heta berî 17`ê Cotmeha 2017’an de jî, di binê dagîrkeriya çeteyan de bû. Bi ruhê berxwedana Kobanê û bi sonda tolhildana şehîdên azadiyê, şervanên YPJ, YPG û QSDê, 19`ê Cotmeha 2017’an bajarê Reqayê ku çeteyan ji bo xwe kiribû paytext, rizgar kirin.

Çeteyên DAIŞ’ê, li bajarê Reqa bi hezaran jin dîl girtin û kirin qefesan. Hin firotin hin jî kuştin. DAIŞ’ê bi serdestiya xwe bajarê Reqayê wek bazara firotina jinan bi kar dianî. Rûyê jinan bi çarşefên reş pêçabûn û destên wan zincîr kiribûn. Piştî rizgarkirina bajêr, bi pêşengiya şervanên YPJ`ê, jinên ku çetayan kiribûn koleyên xwe, çarşef avêtin û bi sedan tevlî refên YPJê bûn. Çeteyan xwest tevayiya jinan û gelan bixin binê sedestiya xwe. Ji ber wê rizgarkirina bajarê Reqayê, bû tolhildana jinên civaka Êzîdî. Bajarê Reqayê ku bi salan di binê dagîrkeriya çeteyên DAIŞ’ê de mabû, bi berxwedaneke dîrokî, hat azadkirin û sîstema Rêveberiya Xweser hat avakirin.

Li ser mijarê jinên bajarê Reqayê kêfxweşiya xwe ya ji Rêveberiya Xweser û şervanan re anîn ziman û diyar kirin ku bi avakirina rêveberiyê cih û rola wan di civakê de çêbû û di qadên civakî de bûn pêşeng. Jinan herwiha got, rêveberiyê rê li ber jinan vekir ku bi kar û xebata xwe bigihin armanca xwe. Ji ber wê divê jin xwedîîrade be û li dijî bindestiyê bisekine.

**“Armanca çeteyan ya işkenjekirinê, şkandina vîna jinan bû”**



Rêveberiya Meclisa Jinan ya Reqayê Hesîna Mensûr, derheqê mijarê de diyar kir ku jin bûye endameke çalak ya civakê û axftina xwe wiha domand: “Piştî çend salan ji zilim û azarên çeteyên DAIŞ`ê, îro jinan di qada leşkerî, siyasî, civakî û çandî de bi serbestî cihê xwe girtiye û bûne pêşeng. Ev jî bi saya sîstema Rêveberiya Xweser e û ti kes nikare vê inkar bike.”

Hesîna herwiha got, bi armanca şkandina vîna jinan, çeteyan berî her tiştî bi awayekî hovane jin işkence dikirin. Dixwestin nerîn û vîna wan di civakê de tine bikin. Ji ber wê direvandin, li ber çavan dikuştin û rêbazên herî xerab li ser wan dimeşandin .

Hesîna Mensûr axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Piştî berxwedana Hêzên Sûriya Demokartîk (QSD) û pêşengiya YPJê ku sala 2017an bajarê me hat rizgarkirin, jinan dest bi kar û xebatê kir û di civakê de bûn endamên herî çalak.”

**Ji tariyê ber bi roniyê ve**

Li ser heman mijarê endama Mala Jinê ya Reqayê Senai El-Ehmed jî nerîna xwe wiha anî ziman: “Ji bo jinan Rêveberiya Xweser derfetek mezin daye, ku xwe ji bindestiyê rêzgar bikin. Rêveberiyê ji me re riya azadiyê vekir. Erkê me ye jî ku em têkoşîna xwe xurt bikin û ji zihniyeta zilam rizgar bibin. Bila jinên me baş bizanin ku ne ji bo karê malê tenê hetine vê dinyayê, mafê wan jî weke yê zilaman di her tiştî de heye. Çi di malbatê de çi di kar de divê jinên me di her qadê de doza mafê xwe bikin. Divê ew jî xwedî gotin bin, lewra jin dibistan e û nifşên nû perwerde dike.”



Senai El-Ehmed da zanîn ku, pirsgirêkên Sûriyê encex bi kar û xebata Rêveberiya Xweser werin çareserkirin, lewra fikir û felsefeya wê demokratîk e û wiha dawî li gotinên xwe anî: “Bi saya rêveberiyê tevayiya gelên bakur û rojhilatê Sûriyê, çanda xwe pêş xistin û parastin. Herwiha ya herî girîng jin bû pêşenga civakê. Ev li ber çavê her kesî tê xuyakirin.”

# “Heta rêber Apo azad nebe ti pirsgirêk nayên çareserkirin”

Dewleta tirkî ya faşîst, her ku tecrîda li ser rêber Abdullah Ocalan giran dike, êrîşa ser hebûna Kurdan jî dijwartir dike. Derbarê mijarê de Şerîfe diyar kir ku armanca dagîrkeran qirkirina gelê Kurd e.

**Şivan Xelîl/Qamişlo**

Endama meclisa giştî ya PYDê Şerîfa Hesen têkildarî tecrîda li ser rêber Apo axivî û da diyarkirin ku tecrîda heyî li ser gelê Kurd tevî ye û wiha domand: “Rewşa niha em tê re derbas dibin, rewşeke pir giran e û ji bo gelê Kurd û tevayiya gelên Rojhilata Navî pêvajoyeke pir girîng û hesas e. Lewra guhertinên ku dagîrker dixwazin bikin, ji bo gelên Rojhilata Navî pir xeter in. Çarenûsa Rojhilata Navî bi çarenûsa gelê Kurd ve girêdayî ye. Vê jî dewletên dagîrker baş dizanin. Ji ber ku em Kurd ji bo hebûna xwe têkoşîneke dîroki dikin û em dev ji riya rêberê xwe bernadin, dagîrker li hemberî berjewendiyên xwe yên li Rojhilata Navî me astengeke mezin dibînin. Ji bo wê dewleta tirkî dixwaze bi faşîzma xwe hebûna me Kurdan ji holê rake.”

Şerîfa da zanîn ku rêber Apo bi felsefeya xwe îradeya gelê Kurd ewqas xurt kir ku, ti carî dev ji tûkoşina azadiyê bernade û wiha berdewamî da axaftina xwe: “ Demên berê dema rêberê şoreşan dihatin girtin, şoreşa wan jî têk diçû. Ji bo wê dagîrkeran xwast têkoşina azadiya Kurdan jî têk bibin. Ji ber wê rêber Apo dîl girtin. Lê negihîştin armanca xwe. Çimkî rêber Apo bi ramanên xwe gelê Kurd kiribû xwedîvîn û bi berxwedana xwe jî, berxwedana gelê xwe gihande asta herî jor. Ji ber wê dixwazin di şexsê rêber Apo de gelê Kurd tine bikin.”

Şerîfa di gotinên xwe de teqez kir ku ti hêz nikarin vîna gelê Kurd bişkînin û ji rêber Apo qut bikin. Herwiha peyam da ku heta rêberê wan azad nebe pirsgirêkên azadiyê jî çareser nabin û wiha dewamî da gotinên xwe: “Çareseriya me bi azadiya rêberê me ve girêdayî ye, heta ew azad nebe wê têkoşîna me raneweste. Lewra rêber Apo ne kesek e, rêber Apo gelek e. Em Kurd li ser fikir û felsefeya wî dijîn. Ji bo wê her ku tecrîda li ser rêberê me giran bikin emê jî têkoşîn û xebata xwe xurttir bikin.

Şerîfa Hesen di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku tecrîd zulma li ser gelên azadîxwaz e û bang li saziyên mafên mirovan kir ku li hemberî zulm û faşîzma dewleta tirkî çavê xwe negirin û li erkê xwe xwedî derkevin.



# Ciwan Îso: Emerîka û Rûsya berpirsiyarên sûcên li Serê Kaniyê ne

**Endamê Komîteya Amadekar ya Komxebata Serê Kaniyê Ciwan Îso got, civaka navneteweyî, bi taybetî Emerîka û Rûsya berpirsên dagîrkirina Serê Kaniyê û guhetina demografiyê ne.**

Bi durişma “Em bimînin emê vegerin” roja Înê şêniyên Serê Kaniyê komxebatek li dar xistin. Di komxebatê de sûcên ku li Serê Kaniyê ji aliyê dewleta tirkî û çeteyên wê ve pêk tên, nîqaş kirin.

Endamê Komîteya Amadekar Ciwan Îso di komxebatê de axivî û behsa azarên şêniyên herêma Serê Kaniyê yên ji ber dagîrkerî û koçberiyê kir.

Îso da xuyakirin ku koçberên Serê Kaniyê ji ber hovîtiya dagîrkeriya tirkî û çeteyên wê di nava zehmetiyan de ne û gelek azaran dikişînin. Herwiha ev dagîrkerî bû sedem ku bi hezaran jin û zarok ji erdê xwe û malên xwe dûr bikevin.

Îso diyar kir ku tecrûbeya bakur û rojhilatê Sûriyê ji bo ewleyiya Sûriyê nimûne ye. Herwiha da zanîn ku hêzên ku naxwazin aramî pêk were, vê tecrûbeyê qebûl nakin. Di sêrî de dewleta tirkî ku bi her rêbaza şerê vê tecrûbeyê dike.

Îso got, di serî de Emerîka û Rûsya civaka navneteweyî berpirsa sûcên li Serê Kaniyê û guhertina demografiyê ye û wiha pê de çû: “Em bang li dewletên Konseya Ewleyiyê ya Neteweyên Yekbûyî (NY) dikin ku Efrînê, Serê Kaniyê û Girê Spî ji xwediyên wê re vegerînin. Biryara 2254 an ya navneteweyî pêk bînin û tevayiya penaberan bi alîlariya navneteweyî û bi çavdêriya NY vegerînin warên wan.”

Îso di dawiyê de wiha got: “Emê hewl bidin sûcên dagîrkeriya tirkî û komên girêdayî wê eşkere û riswa bikin. Emê heta bidestxistina mafên xwe û vegera li warên xwe, li ber xwe bidin.”

***ANHA***



# ‘Rûsya dixwaze herêmên bakur-rojhilatê Sûriyê di aliyê aborî de bifetisîne

**Îsamîl Xalid got, ihtimal heye ku Rûsya li dijî biryara vekirina deriyê sînor yê Til Koçer veto bi kar bîne û dixwaze ji aliyê aborî ve herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê dorpêç bike.**

Hevserokê Meclisa Pariya Sûriya Paşrojê şaxê herêma Firatê Îsamîl Xalid derbarê armaca Rûsya ya girtina deriyê Til Koçer de got, Rûsya dixwaze veto bi kar bîne û herêmê di aliyê aborî de dorpêç bike. Digel ku baş dizane zêdetirî 5 milyon kesî li herêmê ne û pêwîstiya wan bi alîkariyên mirovî û tenduristî heye. Girtina deriyê sînor aloziya mirovî girantir dike. Gelek aliyan jî piştrast kir ku alîkariyên mirovî li herêmê ji sedî 70 kêm bûne.”

Xalid axaftina xwe wiha domand: “Rûsya hewl dide roleke sereke di aloziya Sûriyê de bilîze. Herwiha hewl dide fişarê li Rêveberiya Xweser bike da ku tawîzan li gorî berjewendiyên hikumeta Şamê bi dest bixe.”

Xalid da xuyakirin ku deriyê Til Koçer ne ji bo rewşên mirovî tenê girîng e, di warê pêşkêşkirina alîkariyan de jî girîng e. Bi taybetî li herêmê gelek kampên koçberan hene û pêwîstiya wan bi alîkariyê heye û wiha dewam kir: “Eger ev derî bê vekirin wê bi awayekî mezin bandorê li rewşa herêmê bike.”



Xalid axaftina xwe wiha domand: “Piştî ku aloziya Sûriyê ket destê lîstikvanên navneteweyî yên mîna Rûsya û Emerîka ev alozî ji aloziyeke mirovî veguherî aloziyae siyasî û rewşa aborî bi temamî hat paşguhkirin. Herwiha êdî her dewlet li ser hesabê gelê Sûriyê hewl dide berjewendiyên xwe pêk bîne.”

Îsamîl Xalid di dawiyê de ev nirxandin kir: “Heta niha li Astana gelek civîn qaşo ji bo çareserkirina aloziya Sûriyê li dar ketine. Dibe ku gerên din li dar bikevin, lê ji ber ku armanca wan ne diyar e, encama wan jî ne li gorî daxwaziyên gelê herêmê ye.”

***ANHA***

## Ji nêz ve



### Pêwîstiya Kurdan bi Peymana Rûmetê heye.

**Ednan Muştafa**

Roja Pêncşemê dîroka 08’ê vê mehê li Qamişlo komcivînek bi durişma: “Belgeya Stratejiya Yekîtiya Neteweyî ya Kurdistanê” hat li darxistin. Rast e ev komcivîn bi serpereştiya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê-KNK ‘ê hat lidarxistin, lê di esasê xwe de, pêşxistina xebatên wiha û morkirina “Belgeyeke Rûmetê” ji bo yekîtiya Gelê Kurd pêwîstiya serdemê ye.

Her çiqas civîn bi durişmeke wiha hatiye li darxistin jî, lê di bingehê xwe de, armanca civînê gihîştina yek nêrînê ka çawa karin yekîtiya xwe saz bikin û pêşî li şerekî navxweyî ya Kurdan bigirin bû. Ji bo vê yekê nûnerên partî û rêxistinên siyasî yên rojavayê Kurdiayanê teqez kirin ku bê lihevhatineke civakî, siyasî ne pêkan e ku Kurd bikarin pêşî li lîstikên dagîrkeran bigirin û yekîtiya neteweyî pêk bînin.

Di vê çarçoveyê de, weke tê zanîn di navbera PKK û PDK’ê de, di sala 1983an de, peymana lihevhatinê ji 11 madeyan hatibû imzekirin. Di vê belgeya mijara gotinê de, teqwzî li ser wê yekê hatibû kirin ku ti carî wê aliyên siyasî şerê hev nekin û nekevin xefka dijimin. Lê mixabin aliyekî ev peyman binpê kir û ne tenê li başûr, herwiha li rojhilat û bakurê Kurdistanê jî şerê tevgera azadiyê kir. PDK’ê û Berzanî bi vê feraseta ku ew xwediyê Kurdistanê ne şerê YNK’ê, Yekgirtû Îslamî, Komele, partiyên sosyalîst li ser axa başûr kir. PDK’ê bi vê yekê têr nebû, destê xwe da rêjima Îranê û şerê PDK-Î kir û rayedarên vê partiyê kuştin û radestî Îranê kirin. Dîsa li bakurê Kurdistanê şerê PDK- T kir û pêşengên vê partiyê şehîd xistin. PDK bi kiriyarên wiha têr nebû, ji destpêka sala 1983an ve şerê tevgera azadiyê PKK’ê dike.

Dema mirov li dîroka PDK’ê binêre, PDK’ê her gav xwe li ser du lingan girtiye û rawabûna xwe heyanî roja îro aniye. Ya yekê; PDK’ê ji bo piştgirya derve, ango ji dagîrkerên Kurdistanê pişgiriya Sedam Husyin û hikumeta Îranê girtiye û şerê YNKê kiriye. Piştgiriya rêjima Îran girtiya û bi vê piştgiriye şerê PDK-Îran kiriye. Dîsa ev 38 sal in piştgiriyê ji dagîrkeriya tirkî digire û şerê PKK’ê dike. PDK û Berzanî bi van nêzîkatiyan ruhê xwe nû dikin. Ya duduyan; dînamîka PDK’ê ya parstinê ne gel û partiyên din yên kurdistanî ne, dînamîka sereke ya PDK’ê piştgiriya dagîrkerên Kurdistanê ji wê re ye. Bi gotineke din PDK’ê li ser diyalektîka çiqas hevkarî bi dijmin re ez biki, û tevgera siyasî ya li Kurdistanê tasfiye bikim, ezê meşûrbûna xwe bi dest bixim. Zihniyet û mentiqê PDK’ê û Berzanî li ser vê yekê hatiye avakirin.

Ji ber vê diyalektîkê di serî de PDK û hemû şopdarên wê yên Rojava koma ENKS’ê û sêwiyên wê beşdarî komcivîna KNK’ê nebûn. Ev yek cihê şermê ye.

Divê ji aliyê dilxwezên azadiyê û yên xwe berpirsiyar dibînin dawî li şerê navxweyî bînin û xwedîrol bin. Ev berpirsiyarî ya me tevan e. Erkê me, em dagîrkeriyê rawstinin û dawî li hevkariya bi dijmin re bînin. Bi xwedîderketineke wiha emê erkên xwe pêk bînin û nekevin xefka dijmin.

Ji bo ku ev yek pêk were weke beşdarên komcivîna Qamişlo ya KNK’ê anîne ziman divê beî her tiştî aliyên siyasî li Kurdistanê “Peymana Rûmetê” di nava xwe de imze bikin û hevkariya bi dijmin re heram bikin. Di heman demê de di belgeya Peymana Rûmetê de were nivîsandin aliyê bi belgeyê îltizam neke were teşhîrkirin û ji aliyê civaka Kurd ve werin recimkirin.



# ‘Êrişên ser başûrê Kurdistanê li ser hebûna gelê Kurd in’

Êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser başûrê Kurdistanê dewam dikin. Li dijî van êrişan berxwedana gerîla jî rojbiroj mezin dibe. Lê hevkariya PDKê bi Tirkiyê re metirsiya şerê navxweyî çêdike û gel li hemberî vê xwedîhelwest e.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Derbarê mijarê de endamê lêkolîn û zanista civakî ya Akademiya Civaka Demokratîk Îbrahîm Esad, da zanîn ku netewperestiya Tirkiyê gihîştyiye asta herî bilind û axaftina xwe wiha domand: “Tirkiye ji ber zihniyeta xwe ya netewperwst ti carî statûya Kurdan qebûl nake. Ji bo wê jî her tim êrişî çavkaniya tekoşina azadiya Kurdan dike. Yek ji van çavkaniyan jî Herêmên Parastina Medyayê ne. Ji 23yê Nîsanê ve êrişên xwe didomîne. Ev êriş ne li ser gerîlayên azadiyê tenê ne, li ser Kurdan tevan in.”

**“Metirsî ne şerê Tirkiyê yê li dijî PKKê û Kurdan e”**

Îbrahîm qebûnekirina gel ya hevkariya PDKê bi Tirkiyê re nirxand û got, havkariyeke mezin ya PDKê bi Tirkiyê re heye. Tirkiye PDKê ji xwe re bi kar tîne. Li aliyekî din jî PDK ji bo berjewendiyên şexsan vê dike. Kiryarên wê li dijî berjewendiyên gelê kurd in. Helwesta Tirkiyê ew e ku, Kurdan li hemberî hev bi kar bîne. Niha jî PDK li hemberî gerîlyên azadiyê dide sekinandin û dihêle ku şerê hev bikin.”

Esad da diyarkirin ku Tirkiye dixwaze di nava Kurdan de xeta xiyanetê bide pêşiya xeta berxwedanê û axiftina xwe wiha domand: “Dewleta tirkî bi siyesata xwe ya qirêj dixwaze bigihe armanca xwe. Ji bo wê hewl dide di nava Kurdan de, bi riya PDKê şerê navxweyî derxe. Li ser vê yekê nerazîbûna gelê Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê heye. Herwiha nerazîbûna gelê başûrê Kurdistanê li hemberî vê destekdayînê heye. Lê siyaseta ku li başûrê Kurdistanê tê meşadin zextek li ser gelê wê daye çêkirin. Metirsî ne şerê Tirkiyê yê li dijî PKKê ye, metirsiya herî mezin ew e ku Kurdan bi Kurdan bidin kuştin. Bi sedan leşkerên me bi destê dijmin şehîd bûne, lê ji bo ku ev şerê walat û namûsê ye em pê naêşin. Lê şerê navxweyî pir biêş e, êdî gelê Kurd nikare vê rake û dîrok jî nayê jibîrkirin. Ji ber wê tirsa li başûrê Kurdistanê jî ew e ku Kurd li dijî hev werin bikaranîn. Wê demê yekîtî jî nayê avakirin.”



**“Malbata Barzani xwe xwediyê Kurdistanê dibîne”**

Îbrahîm da zanîn ku PDK xwe wekî statûyeke ji Kurdan re nabîne û wiha berdewamî da axaftina xwe: “Rêveberên PDKê xwe wekî paşa û axayekî li ser Kurdistanê dibînin. Bi taybetî malbata Berzanî xwe xwediya Kurdistanê dibîne. Heta milet jî wisa perwrde kirine ku Kurdistan milkê vê malbatê tenê ye. Niha jî Nêçîrvan Barzanî Kurdistan ji xwe re kiriye wekî şerîkeyekê û berjewendiyên xwe tê de bi kar tîne. Jixwe hevkariya ku bi Tirkiyê re dike ne siyaseteke neteweyî û ne berjewendiyên kurdistaniyan e, siyaseta wî ya pereyan e. PDK li ser felsefe û zihniyeteke olî hatiye avakirin. Ji bo wê jî her tim dixwazin felsefeya olperestî li ser başûrê kurdistanê bidin meşandin. Ev olperestî jî parçebûna di nava gelê Kurd de zêde dike.”

Endamê lêkolîn û zanista civakî ya Akademiya Civaka Demokratîk Îbrahîm Esad ji bo çareserkirina pirsgirêkan got, pêwîst e yekîtiyek were avakirin û axaftina xwe wiha qedand: “Banga me ji tevayiya siyasetmedar û partiyên siyasî re heye, ku pirsgirêka yekîtiya neteweyî çareser bikin, da Kurd bi hev re mafê xwe pi dest bixin û dagîrkeran ji welatê xwe derxin.”

# Dixwazin bakur û rojhilatê Sûriyê di warê aborî de bifetisînin

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Endama meclisa Kongreya Star ya bajarê Amûdê Suheyla Şêxo, têkildarî girtina deriyê Til Koçer û dorpêça li ser Rojava ji rojnameya me re axivi.**

Endama meclisa Kongreya Star ya bajarê Amûdê Suhuyla Şêxo derbarê girtina deriyê Til Koçer de got, girtina derî jî li hemberî Rojava komployeke din e. Dixwazin bi girtina derî gelê herêmê li şûna doza mafê xwe, her tim li ser birçîbûna xwe bihizire. Ji bo ku bikarin bi vê rêbazê rejima Sûrî xurt bikin, ev jî zextek e li ser herêmê tê kirin.



Suheyla herwihada zanîn ku armanceke din ya girtina deriyê Til Koçer qutkirina têkiliyên bazirganiyê ye. Lewra dixwazin krîza aborî ya li bakur û rojhilatê Sûrî kûrtir bibe û bi wî awayî vîna gel bişkînin. Suheyla herwiha da xuyakirin ku dewleta tirkî bi hevkariya PDKê bakur û rojhilatê Sûrî xistiye nava dorpêçê û gotinên xwe wiha domandin: “Dijmin bi van rêbazên xwe yên qirêj dixwaze gel dorpêç bike û bifetisîne. Lê bila bizane ku gelê Kurd gelekî berxwedêr e û li hemberî van kiryarên qirêj serî danayne.”

Suheyla di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku lîstikên dijmin hemû li hemberî pergala rêber Apo ya li bakur û rojhilatê Sûrî hatî avakirin e û got, dewleta tirkî ya dagîrker dixwaze nokokiyên Rêveberiya Xweser û rejima Sûrî kûr bike û li ser vê yêkê pergala Rêveberiya Xweser ya Neteweya Demokratîk têk bibe.

Endama Kongreya Star ya bajarê Amûdê got, çi bibe bila bibe emê bi têkoşina xwe ya azadiyê bi ser bikevin û bang li saziyên mafên mirova kir ku li hemberî zulma tê kirin erkê xwe pêk binîn û bêdeng nemînin.

Herwiha Hevserokê Partiya Aştiya Demokrat ya Kurdistanê Telal Mihemed jî têkildarî mijarê da zanîn ku girtina deriyê Til Koçer ji despêka şoreşê heta niha zexteke pir mezin li ser gel dike û pêşiya alîkariya ku ji gel re tê şandin digire û wiha got: “Eger deriyê Til Koçer vekirî bûya wê gelek alîkariyên mirovî û lojistîk ji gelê herêmê re bihatana şandin. Lê mixabin dewletên herêmê yên dagîrker vê ji bo berjewendî û bazara xwe ya siyasî bi kar tînin. Dewleta tirk zextê li Rûsyayê dike ku derî neyê vekirin û alîkarî ji herêmê re neyê şandin. Rûsya jî ji bo berjewendiyên xwe dengê xwe nake û heta dixwaze derî bikeve binê kontrola rejima Sûrî. ”



Telal Mihemed wiha dawî li axaftina xwe anî: “Girtina vî derî û dirêjkirina girtina wî bandoreke pir mezin li herêmê dike. Eger ev derî vebe wi gel pirsgirêkên xwe yên aborî bi hêsanî çareser bike. Lewra zehemetiyên li herêmê piranî ji ber girtina vî derî ne. Wek gelê Sûriyê eger ji bo çareseriya aloziya Sûriyê, em bikarin li ser maseyekê li hev kom bibin, emê bikarin bi hev re wek gelê Sûriyê mafên xwe di hundirê Sûriyê de jî biparêzin. Ji bo wê ez bang li gelê Sûrî û partiyên Sûrî dikim ku li hemberî listikên hêzên derve bi Rêveberiya Xweser re bibin yek û walatê xwe biparêzin.”



### Bi ruhê 14’ê Tîrmehê yekîtiya neteweyî

**Faruk SAKİK**

Di sala 1982’yan de li zindana Amedê ji Kurdên dîlgirtî re wiha digotin: “Neteweyeke bi navê Kurdan nîne, hûn Tirk in, eger hûn ne Tirk bin jî hûnê bibin Tirk. Çareyeke din ya we nîne! Yan hûnê bibin Tirk, yan jî hûnê bimirin! Yan hûnê kurdîtiya xwe inkar bikin yan jî wê serê we bê perçiqandin! Yan hûnê xwe red bikin yan jî hûnê jiyana xwe ji dest bidin!”

Wateya van gotinan ev bû: “Divê hişmendiya Kurdistanê ji holê bê rakirin, hêza gelê Kurd ya ku bikare serî hilde, divê bê perçiqandin, divê hişmendiya azadiyê ji mejiyan bê paqijkirin, divê yên li ber xwe bidin ji holê bên rakirin.

Li dijî vê yekê pêşengên PKK’ê jî di nava lêgerînekê de û li benda dadgehê bûn.

Ew roj hat. 14’ê Tîrmeha sala 1982 yan bû. Ji du-sê kesan pêve, haya ti kesên din ji tiştekî tinebû û ti kesî nedizanî ku wê ew roj bibe roja bûyîneke dîrokî.

Xeyrî Durmuş, dema ku çalakiya rojiya mirinê ragihand, di beşeke axaftina xwe de wêha got:

…We jî weke bapîrên xwe ti caran ji me fêm nekir, jixwe we hebûna me jî nedipejirand û we her tim em wek leşkerekî li himberî hinekên din şer bikin dîtin. Ji bilî berjewendiyên xwe we ti caran bawerî bi me neaniye, we berê xwe nedaye me û her tim we durûtî kiriye…

M.Hayrî Durmuş, Kemal Pîr, Akîf Yilmaz û Alî Çîçek bi şahadeta xwe, rê li pêşiya hewldanên dewleta tirkî ya dagîrker girtin.

Îro jî rewşeke ku dişibe rewşa sala 1982an heye. Dewleta tirkî ya dagîrker ji 1982’an ve hewl dide ku destketiyên Kurdan ku bi têkoşîneke mezin bi dest xistine, tine bike. Weke ku Xeyrî li dadgehê ji wan re gotibû hûn weke bapîrên xwe tevdigerin, îro jî dîsa li gorî mîrasa ji bapîrên xwe ya ‘tinekirina Kurdan’ girtine, tev digerin.

Îro jî êrişên wan di bakurê Kurdistanê de nehatine bisînorkirin, êrişî her aliyê Kurdistanê dikin.

Îro bi taybetî Herêmên Parastina Medyayê bûne armanca êrîşên wan. Ew baş dizanin ku navenda parastina tevayiya nirxên Kurdan, ev herêm e.

Di demeke wiha de parastina Kurdistanê ket rojevê. Ji bo ku berxwedana gerîla were destekkirin û barê wan were sivikkirin, xebata yekîtiya Neteweyî jî ket rojevê.

Yekîtî wê çawa were avakirin?

Di destpêkê de divê di nava Kurdan de ruhê welatpareziyê were bigewdekirin.

Divê Kurd ji welatên xwe hes bikin.

Ji ber ku van hêzan baş dizanî ku dema ramana “yek welat” ji mejiyê Kurdan were derxistin, wê bi hêsanî bikarin wan radestî xwe bikin.

Divê sîmbolên Kurd û Kurdistanê werin parastin. Ew pêşengên civaka Kurd in.

Ev kes ji têkoşîna azadiya Kurdistanê re bi perspektîf û nexşeriyên xwe pêşengiyê dikin. Dijmin di destpêkê de rêberê Kurdan dike armanc. Me ev yek di dîlgirtina rêber Apo de dît.

Divê hêzên berxwedanê werin parastin.

Pêwîst e her kêliyeke şerê gerîla weke parçeyek jiyana me be.

Dema ku şehîd bibin, pêwîst e em ji dayîkên wan pirtir biêşin.

Dijmin şerê gerîla wisa di mêjiyê me de bi cih kiriye, weke ku em li filmekî şer temaşe dikin.

Nûçeya şer dema ku em di tv de temaşe dikin, nûçe diqede em derbasî modeke nû dibin. Divê ev hişmendî were rakirin.

Dive yekîtî îro were avakirin, sibê dereng e, ji bo Xeyrî jî 15 Tîrmehê dereng bû.